Australian Government | ParentsNext

Gilî, nêrîn û pêşniyar

Alîkarî ji aliyê raberkirên ParentsNext'ê va

Çi tu beşdarek bî, çi rêxistineke civakî an raberkirekî din ê xizmetên xwecihî yê têkildar li ParentsNext'ê, tu dikarî asteke jorîn a xizmetan ji raberkerên ParentsNext çaverêtî bikî.

Wezareta perwerdehî, pisportî û karkirinê (Wezaret) li ser şêwaza raberkirina xizmetên ParentsNext'ê jibo delweta Awstralyayê çavdêriyê dike. Gişt raberkerên ParentsNext'ê divê standard û pîvanên xizmet û tevgeriyanê yên diyarkirî di garantiya xizmetên ParentsNext û bernameyên raberkirina xizmetan ên wan bihewînin. Versiyonên kopî yên van ji aliyê raberkera ParentsNext'ê ya te li ber dest in.

Garantiya xizmetan a ParentsNext'ê jî li ser malpera vê wezaretê li ber dest e. Heryek ji planên raberkirina xizmetan ji aliyê raberkera ParentsNext'ê va li sser rûpela têkiliyan a têkildarî kualîteya wan li **jobsearch.gov.au/ServiceProviders/Search** ye.

Heke têkildarî alîkariya ku ji raberkera ParentsNext'a xwe werdigirî da, nîgeraniyeke te heye, divê:

- Hewil bidî ku destpêkê pirsgirêkê bi riya gotûbêja tev raberkera xwe çareser bikî. Gişt raberkeran hin pêvajo jibo vekolandina mijarên ku tu li ba wan hilêdixî, hene.
- Heke nikarî mijar/pirsgirêkan ji raberkera xwe ra ragihînî, an heke te jibo vî karî hewil daye û hîn razî nebûyî, divê tev Wezaretê bikevî têkiliyê.
- Tu dikarî digel hêla telefona neteweyî ya mişteriyên Wezaretê bi hejmara **1800 805 260** bikevî têkiliyê (têkilî bi riya telefona ne-hevrê (neguhêr) belaş e) û an jî nîgeraniyên xwe di atmosfera raberkirî di vê formê da hilêxînî û wê bo navnîşana destnîşankirî li jêrê bişînî.

Wezaret dê çi bike?

Heke digel hêlka telefona neteweyî ya xizmetên mişteriyan bikevî têkiliyê, berpirsekî xizmetên mişteriyan dê hin lêzanînan bide ber destê te. Heke pêwîst bike, dikare digel raberkera te bikeve têkiliyê da ku derbarê lêzanînên wan ên seretayî bipirse. Nîgeraniyên te derdem û bi awayekî dadmendane dê werin nirxandin û çareserkirin.

Heke te giliyek li cem vê Wezaretê kiriye û ji şêwaza vekolandina wê nerazî yî, tu dikarî giliyekê raberî Dadêner Kaman Wêls (Commonwealth Ombudsman) bikî. Dadêner dikare şêwaza vekolandina giliya te ji aliyê Wezaretê va vekolîne. Tu dikarî seredana malpera dadêner Kaman Wêls (Commonwealth Ombudsman) li adresa jêrê bikî: **www.ombudsman.gov.au.**

DAXUYANIYA JIYANA KESANE

Lêzanînên te dê ji aliyê qanûnê va, ji wan *Qanûna Jiyana Kesane ya 1988* (Qanûna jiyana kesane) bên parastin. Siyasetnameya Jiyana Kesane ya Wezareta Perwerdehî, Pisportî û Karkirinê hûrgiliyên zêdetir derbarê komkirin, zimhêrkirin, bikaranîn û aşkirakirina lêzanînên te yên kesane ku li ber destê vê Wezaretê ne û şêwaza bidestxistina an sererastkirina van lêzanînan ji aliyêî te va raber dike. Her wiha heke tu difikirî ku jiyana te ya kesane hatiye binpêkirin an ji şêwaza vekolandina giliya têkildarî jiyana kesane nerazî yî, ev beş pêkhatî ji hin lêzanînan derbarî çawaniya raberkirina giliyê bo Wezaretê ye.

Şandina vê formê

Ev form dikare bi riya Email an postê were tijîkirin û şandin.

Email: nationalcustomerserviceline@dese.gov.au

Post: National Customer Service Line
Department of Education, Skills and Employment State Office
Reply Paid 9880
Adelaide SA 5001

Ez rê didim Wezareta perwerdehî, pisportî û karkirinê ku lêzanînên jeyî di vê formê da digel raberkera min parve bike: ◯ **Erê** ◯ **Na**

Heke tu dixwazî ku ev Wezaret derbarê nîgeraniyên te tev te an raberkera ParentsNext'a te bikeve têkiliyê, ji kerema xwe piştrast be ku te herîkêm sê bijardeyên jêrê tijî kiribin.

Nav û paşnav

Hejmara naskirinê ya Karxwaz (JSID)

Hejmara lêvegerê ya seredanera Centrelink (CRN)

Kodeya Postê **Telefon**

Telefona destan

Email

Cûreya vekolandinê: (Ji kerema xwe bibijêre)

◯ **Gilî** ◯ **Nêrîn** ◯ **Pêşniyar**

Şirove:

Belgeyên zêdetir:

◯ **Erê** ◯ **Na**

Hejmara gîştî ya rûpelên zêdebarî:

Jibo wergirtina lêzanînên zêdetir seredana vê adresê bike dese.gov.au/parentsnext